Lê wekî min got di sala 1964’ê de bi awayekî fermî li Radyoya Êrîvanê, min yekem car sitrana “ Welatê Me Kurdistan e” tomar kiriye.

Sitrana “ Welatê Me Kurdistan e” Egîdê Cemo amade daye min, lê sitran bi xwe ya Memê Elyas e. Memê Elyas karê wergerê di radyoyê de dikir.

-Di destpêka geşta xwe ya hunerî de, ji hêla civak û malbatê ve tu kelem û asteng li pêş we derketin, an jî hûn bi serbestî tevdigeriyan?

Min tu astengî ji aliyê malbata xwe ve nedît.Bavê min zêde pêşverû bû. Her çi qas dêya min nexwenda bû jî; lê xatûneke hêja bû û zêde qedir dida xwendinê.

Wê hingê Egîdê Cimo girûpeke hunerî çêkiribû, ez jî tê de endamek bûm.

Carekê diviyabû ku em biçin avahiya operayê û herî kêm bi qasî 6 demjimêran ji min dihat xwestin ku ez li ser dikê sitranan bibêjim.

Min got Egîdê Cimo ez ê çawa vê şevê ew qas dem bimînim û dengê xwe bidim, dibe ku bavê min aciz bibe. Egîdê Cimo ji min re got tu qet meraqan neke û di cî de çû bal bavê min.

Dema ku Egîd ev yek ji bavê min re got, bavê min gote min”Qîza min! Tu dikarî biçî û li nik Egîdê Cimo karê hunerî bikî, ev xebateke welatparêzî û pîroz e.”

-Ji bîranînên karê te yên di radyoya Êrîvanê de, çi di bîrdanka we de maye ku nayê jibîrkirin?

Ez bextewar im ku min ew sitrana xwe di radyoyê de got, ku bi saya wê miletî ez nas kirim.

Ez gelek bextewar im ku navê gelek rewşenbîr û nivîskarên wê demê bi bîr bînim, wekî: Xelîlê Çaçan, Egîdê Cimo, Casimê Celîl û gelekên din...

Taximê radyoyê gelekî bi min şanaz dibûn.

Carekê min li radyoyê tiştek got ku ne bi dilê Casimê Celîl bû, ji vê yekê got” Qîza min tu wek qarçîçekê yî, te teze serê xwe ji bin berfê derxistiye û îcar tu hatî min hîn dikî!”

Min şerm kir û êdî min hew deyn kir.

-Bibûre, te zêdetir ji carekê tekezî li ser wê yekê kiriye ku nasnameya te ya hunerî sitrana “Welatê Me Kuristan e”, eger ne ji vê sitranê bûya, Aslîka Qadir li kû bû?

Nizanim!

Ji beriya sitrana “ Welatê Me Kurdistan e” jî, min du sitranên Ermenî gotin û dengê min zêde ji bo sitranên Ermenî xweş e.

Dema ku min ew her du sitran gotin, gelekî deng vedan û hetanî îro jî mayînde mane.

Eger min xwe bidaya sitrana Ermenî, ez bawer dikim ez ê bibûma hunermendeke Ermenî ya pir navdar; lê ez rojhilatzan bûm, paşê min mamostetî kir û ez zewicîm û du zarok ketin destên min.

Ez paye nakim, lê Egîdê Cimo bi xwe digot ku Ermeniyan gotiye “Dê hunermendên Ermenî tu caran wan her du sitranan wekî Aslîka Qadir xweş nebêjin”

-Di salên 90’î de tu ji welat derketiyî, sedemên derketina te çi bûn?

Sedemên derketina min ji welêt bêhtirî xwe siyasî bûn.

Wê çaxê ez di Wezareta Rewşenbîrî ya Ermenîstanê de dixebitîm, çawa Sovyet hilweşiya êdî nijadperestên Ermeniyan serî hilda.

Wê demê Azerî û Ermenî li hev ketin, heçî Ermenî bû kesê Azerî ji deverên xwe der dikir, wekî wan Azerî jî.

Îcar piştî ku ji hev û din xelas bûn, Ermeniyan gef li Kurdên Misilman ên gundî xwar, ji Kurdan re gotin “Eger hûn dernekevin, tişta me bi Azeriyan kir em ê bi we jî bikin”.

Wê demê 20 hezar Kurd ji neçarî malên xwe hêlan û li temamî derdorê derbider bûn...

Îcar kesên li Êrîvan man jî, gelek zor û astengî li wan hat kirin.

Êrîşî mala Çerkezê Reş kirin, li Karlînê Çaçan xistin û Se’îdê Îbo hebû ku doktorê zarokan bû, Ermeniyan ew kuşt.

Di pê kuştina Se’îdê Îbo re, em wekî rewşenbîr ji welêt derketin ji ber me dizanî êdî dora me jî ye.

Ermenîstan yekemîn dewlet e ku dubendî êxist di navbera Êzidiyan de.

Paşê me girûpek çêkir û seredana Serokê Ermenîstanê kir. Me jê re got hûn çawa dibêjin Êzidî ne Kurd in?

Ji me re got ma gunehê min çi ye eger hestê neteweyî li bal wan nizm e.

-Zêdetir ji 50 salan e ku tu bi dengê xwe xizmeta çand û hunera Kurdî dikî...Gelo miletê Kurd bi hemî dezgehên xwe ve, ji hêla guhpêdan û xwedîderketinê ve, mafên te dane te?

Hîç dezgehekê ne jî tu kesekî tu tişt nedaye min.

Bi tenê heqê min ew e ku milet ji min hez bike.

Ez serbilind im ku min xizmet ji miletê xwe re kiriye û bi saya xebata min milet ji min hez dike.

Ez yekemîn jina Kurd im ku sitrana siyasî gotiye.



-Zarogotin û wêjeya Kurdî ya devkî gelekî dewlemend e, li beramber wê; hunera Kurdî di serdema nû de, kariye wekî ya folklorî cihê xwe li nêva civaka Kurd bigire û gavine baş biavêje?

Zargotina me behreke bêbin e.

Zargotina me bi dewlemendiya xwe bû sedem ku Kurd gihîştin roja îro.Eger ne ji zargotina me bûya, em ê ji zû ve winda bûna.

Lê lê û lo loyên me em gihandin vê rojê.Lorîkên dayîkên me ku di ber pêçeka me re disitrandin, em gihandin roja îro.

Lê ya gerek ew e ka em ê niha çi lê zêde bikin...?

Hunera Kurdî di roja îroyîn de, jixwe tiştek li zargotinê zêde nekiriye; berevajî wê zerer jî gihandiyê.

Hunermendên me yên îro, bi şêweyê Kurdî yê resen nasitrên û awayên hin çandên din dixin sitranên xwe, ev bi xwe ji bo hunera Kurdî jehr e.

-Eger em rewşa hunerî li nik guhdarê Kurd binirxînin, guhdarîkirina li sitranekê girêdayî naveroka wê ji hêla dengê hunermend, gotin û awazên sitranê ve ye; gelo bi derketina evan amûrên muzîkê yên nûjen re, guhdarê Kurd çêj û zewqa xwe di bijartina sitranê ji dest daye, yan na?

Belê ji dest daye!

Sitranên zargotina me, her yek ji wan xudana serpêhatî û çîrokekê ye.

Pêwîstiya Kurdan bêhtirî xwe bi rengê folklor heye.

Xwîna folklorî di reh û damarên Kurdan de digere.

Her çi qas xelk folklorê me didize jî, lê hingî dewlemend e tu caran xelas nabe.

-Tu hevdema gelek hunermendên Kurd ên navdar î, di serdema radyoya Êrîvanê de hunermendê/a herî zêde te lê guhdarî dikir û kêfa te jê re dihat kî bû, û aniha kî ye?

Di destpêka xebata xwe ya hunerî de zêde zêde min giranî nedida hunerê.

Wê demê min tiyatroya devkî jî pêşkêş dikir, ez bi rola “Kumsorê” dilîstim.

Min baş li Eyşeşan, Mihemed Arifê Cizrawî û Şakiro guhdarî dikir û bandora wan baş li ser min hebû.

Ez naxwazim li hunermendê îro yên gênc guhdarî bikim.

Mihemed Şêxo li nik min hunermendekî pîroz e, kêfa min zêde ji dengê wî re tê.

Di dema îro de ez pir li Xoşnav Têlo guhdarî dikim. Dengê wî dengekî taybet e, nazik e.

-Hunera Kurdî li nava tevahiya Kurdan û bi taybet li Rojavayê Kurdistanê, hûn çawa dinirxînin?

Hunera me bandora wê li ser tevahiya derdorê heye. Sitrana Kurdî ya modêrn ne ku tu bikî Erebî, Turkî û Farisî; modêrn ew e ku Kurdî û modêrn be.

Sitrana Kurdî ku bêhna Erebî, Turkî yan jî Farisî jê bê, em ê pê bifetisin.

Mixabin, ew kesê ku karibe li nava Kurdan sitraneke modêrn a gelekî xweş çêke, tune ye.

Li nava me Kurdan Dilşad Se’îd heye, mexabin wî jî xwe gelekî neêşandiye.

Dilşad Se’îd der heqê Pêşmergeyan de sîmfoniyek çêkiribû, lê hilbijartina wî ji hunermendan re ne rast bû..

Ji Şivan Perwer bigire û pê de, dengê yekî ji wan jî ji bo wê sîmfoniyê ne guncaw bû.

Heyfa wê muzîk û wê xebatê.

-Ji bo demên bê, tu projeyên te yên hunerî hene?

Hunermend xwe diavêje ser sêla sor. Saziyên me tune ne, eger sazî hebûna dê rewş ji wilê bi gelekî xweştir bûya.

Hetanî ku em kilîbekê çêdikin an jî sitranekî tomar dikin, em xwe diavêjin pir cihan.

Lê dixwazim tiştekî tenê bibêjim “Miletê ku hurmet û siyanetê nede hunermendên xwe, ew tu carî nabe milet”

Li nik me li hunermendan dinihêrin wekî mirtiban, an jî li hunermedan dinihêrin wekî ku robot in.

Lê na, ne wisan e, sitrana “Welatê min Kurdistan e” şoreşek bû.

-Rojavayê Kurdistanê ber bi federaliyê ve diçe, Başûrê Kurdistanê jî ji bo serbixwebûnê amadekariyên xwe dike, tu çawa li van guhertinan dinihêrî?

Helbet ev guhertin pîroz in.

Şens û bextekî mezin e ku em gihan rojeke wisa.

-Ji bo te, gundê Elegezê çi ye?

Gundê Elegezê bo min bîranîna min e, zaroktiya min e, jiyana min e.

-Êrîvan?

Şehrekî ezîz e bo min. Êrîvan bo min gencîtiya min e.

-Li nik te, sitrana Kurdî çi ye?

Pîrozî ye.

-Di jiyana xwe de li tiştekî poşman bûyî?

Ez poşman bûme ku min gelek sitran di radyoyê de negotin.

Ez zewicîm û zarok ketin destên min...

Min karîbû gelek tişt di radyoyê de bikira.

-Di zaroktiyê de te bawer dikir ku tu yê bibî hunermend?

Na min bawer nedikir.

-Gotina Dawî...

Gotina min a dawiyê belku gotina her rewşenbîr û hunermendekî Kurd e.

Hêviya min ew e ku Kurd bibin yek û piştgîriya Serok Mes’ûd Berzanî bikin, ji ber ku barekî pir giran li ser pişta wî ye.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App 00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Ehmedê Şêx Salih..Şêxê Helbesta Kurdî

Hîmdarê Zanînê li Indîwerê:
Ehmedê Şêx Salih hem bi olzaniya xwe, hem jî bi helbesta xwe, kariye nasnavê şêxîtiyê bi dest bixe, da ku bibe "Şêxê Helbestê".
Di sala 1935'ê de li gundê Indîwerê yê li perava Ava Mezin(Diclê) ku girêdayî Dêrika Hemko ye, ji dêya xwe bûye.
Li dibistaneke bajarê Dêrikê xwendina xwe ya seretayî temam dike, lê tişta ku divê were bibîrxistin ew e ku Ehmedê Şêx Salih xwendina 5 salan tenê di 3 salan de qedand û ji hemî hevalên xwe bihurî, ev yek jî ji ber zîrbûn û zanebûna wî bûye.
Bi gotina wî, destpêkê li ber destên melayan fêrî xwendinê dibe û Qur'anê xitim dike, dema ku diçe dibistana Dêrikê da ku tevlî refa yekê bibe, rêvebirên dibistanê ji jîrbûna wî hay dibin û di cî de wî dibin refa 3'yê.
Ehmedê Şêx Salih bi qasî 3 salan dixwîne û bawernameya Sertafîkayê wer digire, di wê hingê de rêdaneke taybet ji bo wî tê dayîn da ku biçe Erebistana Si'ûdî xwendina xwe bidomîne; lê ji ber ku ew takekurê dê û bavê xwe bû, bavê wî nehêla ku biçe.
Ehmedê Şêx Salih, dibe yekemîn mamosteyê fermî di dibistana Indîwerê de û bi dehan ji nivîskar û rewşenbîran bi saya wî der diçin.

Qelemşorê Nivîsîna Resen:
Ehmedê Şêx Salih li nêva tevahiya nivîskarên Kurd tê naskirin ku bi awayekî bipergal û sipehî hestên xwe li rûyê pelê bi cih dike û bi zimanekî petî û resen, ristên xwe dihûne.
Dema ku li dibistanê di refa 4ê de dixwîne, li bûyînên Şoreşa Şêx Se'îd û Komara Mehabadê diponije û bi hêrseke Kurdewar, heyvanekî pak di giyanê wî de dimeye, da ku paşê hizir û ramanên xwe bi rêya pênivîsa xwe der bibire...geşta nivîskariya wî ji vir dest pê dike.
Lê xaleke nakok di biwara nivîskariya Ehmedê Şêx Salih de hebûye, ew jî ku tu caran helbest û nivîsên xwe komî ser hev û din nedikirin û piraniya wan winda dibûn...mixabiniya xwe bi wê yekê tînim ku bibêjim gelek helbestên wî hatine dizîn jî..
Ehmedê Şêx Salih, bi hostayî û li gorî bend û pîvanên rêzimanî hevokên xwe li pê hev rêz dikirin.
Ji hêla avakirin û sazkirina helbestê ve, M.Ehmed xudanê reng û şêwazekî taybet bû.Her çi qas bi awayekî kilasîk ristên xwe dihûna, lê wêne û tabloyên nûjen li helbesta xwe bar dikir û kirasekî sipehî li helbesta xwe ya bangwazî jî dikir.

Konê di Xewnê de...Mayînde Ma:
Dema ku Ehmedê Şêx Salih bi seredanekê diçe Bakurê Kurdistanê û di şevekê de çaxa ku li nêva nivînên xwe bi xew ve diçe, di xewna xwe de Konekî Reş ê vegirtî li pêşiya deriyê mala xwe dibîne.
Şêx Ehmed hîs dike ku tiştek bûye, lê ew tişt çi ye? Nizane!
Dema ku digihe gundê xwe (Indîwer) û çawa ji mala xwe nêzîk dibe, dibîne ku xewna konê reş bi cî bûye û konê kurê wî yê nixurî "Ebdulxefar" li pêşiya deriyê malê vegirtî ye.
Ebdulxefar di qezayeke trafîkê de jiyana xwe ji dest da.
Şêx Ehmed, di şontaziya kurê xwe de, tenê karîbû evê bûyîna trajedîk bi rêya helbestê vebêje, ji lew re di şîna kurê xwe de wiha dibêje:
Şiyar bûm konê reş xuya kir ey hawar
Herim qîr û girîn e
Paşê hunermendê Kurd ê navdar Mihemed Şêxo ev helbesta wî bi awaz kir û bi xweşiya dengê xwe, ev helbesta ku bûyîna mirina kurê Ehmedê Şêx Salih vedihewîne, mayînde hêla.



Asoma Girtinhevê:
Asoma Girtinhevê di 2015'an de ji Weşanxaneya Temûzê ya li Şama Paytext derket.
Asoma Girtinhevê takeberhema Şêx Ehmedê Salih bû ku hatiye çapkirin, ne tenê wisa, lê gelek nivîskar dibêjin ku ev yekem berhem e ku bi vî awayî û bi vê naverokê li nêva Kurdan derdikeve.
Asoma Ehmedê Şêx Salih, bi rêya helbestê mebestê vedibêje û li jêra malikên ewan helbestan, nivîskarê gewre şîroveyeke bi rêk û pêk bi zimanê Erebî dayê.
Naveroka vê berhemê, şerê di navbera başî û nebaşiyê de ji destpêka gerdûnê ve digire xwe, hetanî ku bi Şoreşên Eylûl û Gulanê yên Başûrê Kurdistanê ve derdikeve.
Her wisa berhema wî wekî tûrikekî dagirtî belgeyên kêmpeyda ye, hemî bûyer û qewamên siyasî û dîrokî tevlî agahiyên xaknîkgarî û şîroveyên siyasî vedihewîne.
Di Asoma xwe de, Ehmedê Şêx Salih giranî daye zelalî û rastiyê û bi hemî şêwazan ji şek, guman û texmînan bi dûr ketiye.
Şêx Ehmed bi xwe gotiye ku wî ji paşxaneya serpêhatî û hêçana xwe ya dûr û dirêj bi derdorê re, ev berhem afirandiye.
Ji bilî ku ev berhem ji hêla naverokê ve pir dewlemend e, ya jê balkêştir ew e ku tenê yek gotina biyanî jî di malikên helbestan de nayên dîtin, helbestine xwerû Kurdî ne.
Di Asoma Girtinhevê de ferhengeke bêhempa peyda dibe, ji ber ku Ehmedê Şêx Salih bêjeyên Erebî di malikên xwe de bi cih nekirine, ji vê yekê li gorî pîvanên peyvsazî gelek têgeh û bêjeyên nû afirandine, piraniya wan bêjeyên afirandî girêdayî pesn û navên Yezdan in.

Siyaset û Civak:
Ehmedê Şêx Salih bi yek nivîsê hemî aliyên jiyana wî ruhnî nabin, ji ber di gelek şax û hêlan de xebat kiriye û di bîrdanka her kesekî Beravî de serpêhatiyeke xwe hêlaye.
Çawa ku li Rojavayê Kurdistanê tevegra Siyasî dadimezre, Ehmedê Şêx Salih bi dest xwe re tevlî tevgerê dibe.

Di salên 60'an de li gel birek ji welatparêzên Kurd tê desteserkirin û ji bo Zindana Mezê tê veguhastin. Di Zindana Mezê de li gel Osman Sebrî û Nûredîn Zaza cezayê xwe dixwe.
Di ber doza gelê xwe de her dimîne xebatkar û welatparêz. Tevlî rewşa aborî ya xerab, Ehmedê Şêx Salih tu caran li xwe der nedixist û xwe ji tu kesî re kêm nedikir.Demeke baş karê dirûnkariyê kir, paşê ji ber rewşa tenduristî rawestiya.
Di nêva civak û derdora xwe de, her û her mirovekî xêrxwaz, şîretkar û geşbîn bû, ji vê yekê temamî xelkên deverê li hember wî bi rêz bûn.

Ji Şarê...Vegeriya Şar:
Piştî xebateke dûr û dirêj û di 82saliya xwe de, Ehmedê Şêx Salih di 22'yê meha 10'ê de li sala 2017'ê, li Nexweşxaneya Şarê ya li Helwêra Paytext jiyana xwe ji dest da û paşê li goristana şarê xwe "Inîwer" hat veşartin.
Ehmedê Şêx Salih û Seydayê Cegerxwîn, di mirina xwe de ji aliyê meh û rojê ve, hemdîrok in.

Taybet - Bûyerpress

Di Heyama Dîrokê de...Şanoya Kurdî

Ji hezarên salan ve ye ku hunera şanoyê di rewşeke awarte de ji dayîk bûye.
Ev huner (Şano) ji malzaroka olên asîmanî, bawerî û şaristaniyên kevnar pijiqiye.
Evê hunerê dikarîbû hebûna xwe biparêze, her wiha ji nav hunerên beriya xwe û yên li pey xwe, wekî hunera herî bibandor xwe bide pêş... Ji aliyekî din ve, gelek şaristaniyên zemînê bi vê hunerê mijûl bûne û sûd jê girtine, Kurd jî ji mijûlbûna bi şanoyê ve bêpar nemaye, wan jî sûd jê girtiye, derfet ji dest xwe bernedaye û bi hevnêzîkatî şano bi kar aniye.
Lê pirsa ku di hişan de digere ew e, gelo Kurdan kengê şano nas kir?
Belê, rasteqîniya dîrokê tekez dike ku şano di serdema Fer'ûniyan de ji dayîk bûye, her kesê ku bi şopandina dîrokê ve mijûl dibe, digihêje wê yekê ku hevtêkiliyên xurt û asê di navbera Fer'ûnî û Mîtaniyan "Bavpîrên Kurdan" de hebûn, her wiha girêbestên bazirganiyê û têkiliyên hevbeş jî di nava wan de li dar bûn û bi buhrîna demê re her geş dibûn.
Bi van têkiliyên ku me gotin re, êdî pevgirêdanên şobendiyê(Zewac) jî li ser asta malbatên şahinşahan dihatin kirin, çawa ku kurê şahinşahê Fer'ûniyan di wê hingê de, keça şahinşahê mîtaniyan, a ku bi nasnavê Fer'ûniyan "Nevertîtî" hat nasîn, ji xwe re kir hevjîn...
Bi van pevgirêdanan, hunerên wekî xêzkirina li ser latan û rengandina caman ku Mîtanî bi wan navdar bûn, bo Fer'ûniyan hatin veguhastin, her wiha ji Fer'ûniyan jî hunera şanoyê hat girtin, ji lew re em dikarin bibêjin ku Kurdan ji wê hingê ve şano nas kir.
Hêjayî gotinê ye ku li gor baweriyên wê hingê, şano, wekî çavkaniya têkiliya canî di navbera mirov û Xwedanan de bû, her wiha şano hêmana coşkirina şervanan û xurtkirina moralên wan bû.
Pêşketina şanoyê di heyama dîrokê de, ne bi hêsanî bi rê ve çû, dêmek pêşketina berçav a şanoyê ji ba "Evîlos" dest pê kir, lê belê li ba Kurdan nîr û derfetên zordar rê nedida ku ev huner di heyama dîrokê de, ta bi asta vexwestî pêş bikeve, zêdebarî ku di sala 1916'ê de, ji encama rêkeftina " Sykes–Picot" Kurdistan parçe bû, ji lew re dagîrkerên Kurdistanê hewl dan ku nasname û şaristaniya Kurdî di hemû waran de, ji nava wan huner û şano jî, winda bikin.
Ji nava vekolînên ku vê yekê diçesipînin, vedîtina bajarê "Hemoker" ê ku ji aliyê şandeya Emerîkayê ve, di herêma Cizîrê de hat vedîtin û li gor dîrokê, nişteciihên wî bajarî bi zimanê Hindo-ewropî "Yê bavpîrên Kurdan" diaxifîn û li herêmên bakurê Sûryayê û başûrê rojhilatê Tirkiyê belav dibûn.
Her wiha Dêl Diyorant di pirtûka xwe ya bi navnîşana "Çîroka Şaristaniyê" de tekez dike, ku yekemîn hejmar di dîroka mirovahiyê de, li Rojhilata dêrîn ango li Kurdistanê, berî şaristaniya Aşûriyan bi 3000 salan, hate vedîtin, û eger binkolînên arkolojîk bêyî sînor û qedexekirin dom bikirana, dê gelek şanogeh jî bihatana vedîtin, her wiha bi vegera li hevtêkiliyên di navbera Kurd û Fer'ûniyan de, xuya dibe ku şano ji bal bavpîrên Kurdan dest pê kir, û bo cîhanê hat veguhastin.

Orhan Kemal

Di serdema nûjen de, gelê Kurd dikarîbû dîroka xwe ya şanoyê belge bike. Yekemîn şanogeriya Kurdî bi navnîşana "Ronahî û Zengê" di sala 1905'ê de bi romaneke Kurdî ya resen û ji aliyê tîmeke lîstikvanên Kurd ve li Hewlêrê hat şanîdan, her wiha di heyama Komara Kurdistanê de li Mihabadê jî, şanogeriyek bi navnîşana "Dayîka Xwegorîker" hat şanîdan, lê eger em li dastana "Mem û Zînê" ya helbestvanê Kurd Ehmedê Xanî vegerin, em ê bigihêjin ku ew dastan ji beriya sedên salan ve, bi rêbazeke şanogerî hatiye ristin û hûnandin, her wiha di serdema nûjen de şanogeriya "Birîna Reş" a nivîskarê Kurd Mûse Enter jî li ber çavan e.
Di dûmahiyê de em tê digihêjin ku tevlî zordarî û sitemkariya li Kurdan hat kirin û tevlî bizavên herişandin û tunekirina dîrok, şaristanî û kevneşopiyên wî jî; gelê Kurd dikarîbû nasname û hebûna xwe biparêze û yek ji rêbazên xebat û berxwedêriyê jî Dika Şanoyê bû, ku ev huner hem amraza vegûhastina ezmûnan û doza mafên rewa bû, hem jî alava hevgihiştin û tevhevbûnê bi gel û çandên dîtir re bû.

Xwezî Ez Kerr Bûma (Nebihîsta)

Li vir her tişt kêm bû, lê çêjek ji bajêr difûriya, xwe li porê welêt dida û bi xwe re her tişt bi wate dikir…bi xwe re jiyanek diwelidand.
Ew jiyan, hêviya jiyaneke hîna xweştir bû, raza rojên nixumandî bû, bêdengiya qîrîniya azadiyê bû, ji bo wê çavên me her hişyar bûn û li benda wê rojê bûn; lê dîsa ew bayê qebe ku li me û bajêr dida, xeyalên nûavabûyî, nîvmayî dihişt.
Ez jî di hembêza vî bajarî de bi şev zû radiketim. Min nedixwest ku bi şevê re rûnim û hêviyên xwe li pişta sitêrkan bar bikim; ji ber ku min tu hêvî nehişt ku li pişta vî bajarî bar nekir û hemî xewn û xeyal di paşûla bajêr de jiyan.
Min nedixwest gazincên xwe bi şevê bikim, ji ber ku ji bilî kuştina bêdengiya azadiyê, tu gazincên min tune bûn.
Min nedixwest xewnan bibînim, ji ber ku min xwe ji xwenan vala kiribû. Min nedixwest di sibe de biramim ji ber ew roj (îro) pir xweş derbas dibû.
Min dixwest hemî wextên min sibeh bin, da ku bi dengê şabûnkên anê(Dayê), bihna nanê kuncî û xwendina awazên çîvçîvokan ji xewê rabim.
Wisa bû, her ew deng, ew bihn, dengên zarokên bajêr, dengê etarên nanê hişk û keskahiyê, awazên çivîkan, hejîna bejna darên Sewilî û nimnima axavtinên jinên cîranan em ji xewê radikirin. Tu şênî li bajêr nedima, bi çavekî tijî hezkirin û bi bendewariyeke bedewtir ji xew radibûn, piraniya jinan xwe li firna Evdikê digirt, hinekî bi fedîbûn û hinekî bi ken, sibehan nanê kuncî dikirî û kalemêran jî li firoşgeha Hemedê Mêst digirt û ji zarokên xwe re dikirî.
Anê yek ji wan jinan bû ku hem nanê kuncî dikirî, hem jî bacanên reş û îsot dibirin û di firnê de dibiraştin.
Bavo yek ji wan kalemêran bû, min sebir nedikir ku bihataya mal û mast bianiya, da ku me bi kenekî nû taştêya Kobankî bi malbatî bi hev re bixwara.
Erê! Her sibeh vî bajarî bi ken û bi soza pêkanîna hêviyan, bi rojeke nû pêşwazî li şêniyan dikir, zarokên xwe li bervaneka xwe girêdida û li ber deriyê dibistanê datanî, paşerojeke bieşq ji wan dixwest.
Ev bajar hêjayî candayînê bû. Sibehek hat anê nanê kuncî, bacan û îsotên biraştî anîn; lê ne bavo hat, ne jî mast anî? Wê sibehê, me bê bavo û bêmast taştêya xwe nîvço û bi zorê xwar.
Demek çû û sibeheke din jî hat, em li benda anê man ku nan, bacan û îsotan ji me re bîne; vê carê ne anê hat, ne jî nan û bacan anîn.
Bû sibeha sisiyan, dengê anê û bavo ji bajêr hate birîn!Nema deng li me kirin, nema em bi şabûnkî û bi delalî ji xew rabûn, bi wan re jî awazên çivîkan ji tirsa dengê mermiyan(avêştok) wenda bûn û dengê zarokan jî bi

Cîhan Hesen

xwe re birin..wî bayê kurr xwe li rûyê her malekê dida û bi xwe re diterikand.
Ji nişkan ve dengek bi hemî kolanên bajêr ket, digot: Şêniyên bajarê hêvîker! Îro şehîdên me hene. Ji wan şehîdan, navên anê, bavo û hin zarokên bajêr jî dihatin gotin .
Êdî, hêdî hêdî ji bervaneka bajêr zarok kêm bûn.
Ji wê sibehê heta niha dengê anê, kenê lîstoka zarokan, qîrînên etaran, muzîka hejîna daran, hetanî bi stranên çivîkan ku av li dengê wan zelal bû, nema deng ji wan hat; ji wê sibehê heta niha, li ser hevoka "Îro şehîdên me hene" em ji xew radibin.

Hew, êdî jiyan sekinî! Naxwazim sibeh were û hişiyar bibim, naxwazim hîn biêşim.
Ew sibeh bû sibeha şehîdan û ev bajar bû bajarê şehîdan.

Dixwazim tiştekî nebihîzim, tenê xwezî dikim ku ez kerr bûma, êdî min ev deng nebihîsta û êdî min ev êş danequrtanda hinavên xwe.
Tenê vê xwezî dikim.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Helbestine Bijartî...Bedran Penaber

DILBER

Bi salan e em destê xwe dirêj dikin
Lê nagihê destê te
Gustîlkên bihara
Li welatê me hatine darvekirin...
Davikên bekoyan rê bi me nadin
Em bigehên mirada xwe
Me rêya xwe winda kiriye
Di nav berfa Zagrosê de
Xwîn di cannê me da bûye bûz…
Bi salan e em destê xwe dirêj dikin
Lê nagehê destê te Dilber
Me ne roj e
Me ne şev e
Em xerîk û dilkovanên te ne Dilber
Heyranok û payîzokên me bêxwedî ne
Çîrokên me birîndar

Bedran Penaber, jidayîkbûyî sala 1985'ê ye. Li gundê Nexerê yê girêdayî Şernexa Bakurê Kurdistanê çavên xwe li jiyanê vekirine, lê ji ber sitema dewleta Tirkiyê, hêj biçûk bû bi malbatî penaberî Başûrê Kurdistanê dibe.

Destanên me koçber in
Minarên Heranê hilweşok
Kevokên Mêrdînê penaber in Dilber
Bi salan e em destê xwe dirêj dikin
Lê nagehê destê te Dilber
Wezaretên xiwêriya nizanin
Tayek ji pûra serê te
Em bi şagula welatê xelkê nadin
Em ê xwe bikujin
Rondika ji çavê te narêjin
Bûk û zavatiya me
Qesir û qûnaxên dilê me
Hemû ji bo te ne Dilber
Helbestên me
Birûskên bûkaniyê ne
Em di nav noteyên mûsîqe ya Baethovin da
Kirasên sor û zer
Ji destana lawikê Metinî berbiba dikin
Di oxira karwanên evîna te de
Dorhêlên tawusan em xwazgînî ne Dilber
Em hemû roja bi mirinê re
Govenda azadiyê digerînin
Milek yê me kotirk
Milê din baz, berxwedan û ala sor e
Em mêvanê bîranînên zarokan e
Di kolanên xeyalan de em zindî ne
Ji pesarên nehênî
Zinarên helbestan dihonin
Xunçeyê gula
Serhildane li zeviya dilê me
Menale Dilber
Me pişta xwe daye mirinê
Me sond xwariye
Bi serê dayika xwe
Sînga me mertalê bûkaniya te ye Dilber

Mirin Ne karê Me Ye

Êdî mirin ne karê me ye
Em jiyan nebûne ku bimirin
Bila ewên ku jiyan bûyîn bimirin
Bila ewên ku hêj em nehatin dinyayê
Gorên me bi destê kalên me dayîn kolanê
Û em di dozexên mirinê de avetin bimirin
Bila ewên ku xwîna zarokên me mêtine
Bila ewên ku singo li singê dayîkên me xistine bimirin
Bila ewên ku kewên li ser hêkan
Bazên birindar
Xezalên avis
Jinên ducan kuştine bimirin
Ma me ji derveyî êş û janan
Ma me ji derveyî waweylan pê ve
Çi dîtiye ku em bêjin em ê mirin
Ma me destê xwe daye kê
Û xencerek li pişta me nedaye
Ma me pişta xwe daye kê
Û keraneyek li patika me nedaye...
Bila ewên ku dilê me perçiqandin
Û gustilkên xwe xistin
Tiliyên desgirên me bimirin
Bila ewên ku bedenên dayika me Kurdistan
Zozanên Debde Golê-Nebirnavê
Ji bo xwe kirin benahol bimirin
Bila ewên ku carnan em dikirin Enkîdo
Gur dikirin Gilgamêş
Û carna em dikirin Gilgamêş
Gur dikirin Enkîdo bimirin
Bila ewên ku kemîn danîne riya evîna me de
Bila ewên zimanê me sencol-bi jehir kirin
Û bi me dayin vexwarin bimirin
Bila ewên ku çar keziyên Newrozê
Gurzên rojê ji hev qut kirine bimirin
Bila ew mirovên ku goştê mirovan dixwin
Nemrûd û firewn û zebanî û dehak bimirin
Mirin êdî ne karê me ye
Em jiyan nebûne ku bimirin

Li Başûrê Kurdistanê qonaxên xwedina xwe ya destpêkê diqedîne, paşê tevlî Akademiya Ziman û Dîrokê li Mexmûrê dibe û di 2006'ê de dibe derçûyî Akademiyê.

Bila ewên ku jiyan bîyin bimirin
Bila ewên ku hêj em nehatin dinyayê
Gorên me bi destê kalên me dayîn kolanê
Û em di dozexên mirinê de avetin bimirin...
Bila dengê me biçe dost û dijminan
Guh u çavên xwe vekin
Çiyayên bilind bê rê nabin
Newalên kûr bê av nabin
Birûsk li darên mezin didin
Û li welatê hêviyan zivistan nayê
Erê, em di bin ala Kurdistanê de ji dayik nebûne
Lê em bi xwîna lehengên Gabarê
Û gora zarokên Helebçe
Sond dixwin
Em ê di bin ala Kudistanê de
Di bin vê alê de xatir ji dinyayê bixwazin
Ew e soz
Ew e peyman
Ew e biryar...

Li Welatê Me

Li welatê me pêş bê dinyayê
Qebra te dikolin, şerbeta mahra te vedixun
Û mengena keşîtya te
Berew peravên taristanê birê dikin
Ma veger wê çawe be ?

Li welatê me hêj kenê evînê bi ser lêvan neketî
Şahiya zewacê , bêhna sexê bi ser dila dişkênin

Li welatê me zarok digrîn , dayik dêşin
Û bav bi dûkêla cigarê
Cenga eman û nemanê dikin

Li welatê me biyanî " ya star û bêlome ne"
Ne elah !
Yezdan Zeose dihewînin
Mala feqîran noqî lehiya heriyê jî bibe
Sola fêlbazan şil nabe
Ma çi xema Ewrûpiyan e...
Li welatê me pêş teqîneweyan
Hêjmara kuştiyan diyar e
Li bazara Dolar e, serê miriyan
Û meresima kelaxan qedexe ye
Li welatê me gunehbar bêguneh in
Û bêguneh gunehbar in tewanbar in
Li welatê me birsî têr in û têr birsî ne
Hawar Xweda



Ev çi xezeb e!!!

Ruha Min

Serê vê sibehê bi dilopên girî
Fîncana qehwê bi min nede vexwarin
Ez peleka çilo me
Li payîza vê ŞENGALÊ
Ji dara bero helwerya me...
Hûriyên Çiyayê SÎNCARÊ
Li bazarên Mûsilê tên firotin
Û tu destê min digirî – dibê "were"
Maçekê li çavê min de
Ruhê min bi pêleka kenê xwe bişo
Oxira xwe bi xêr ke
Û here...
Mirin jî bi ser me de hilweşê
Milên me dest ji govendê bernadin

Ey Dayika Min Kurdistan

Ji bo te çend bikim
Qîrîn û hawar

Mamoste Bedran Penaber li Zanîngeha Selahedînê xwendina Wêjeya Kurdî temam dike û aniha Hevserokê Fakulteya Wêjeya Kurdî li Zanîngeha Rojava ye.

Axîn û nalîn
Keder û gazî
Eman û neman
Nabe bedelê
Gul û sosin
Mêrg û çîmen
Evîn û hesret
Deşt û zozanên te
Nabe bedelê
Eşqa bilbilan a li ser kirasê bejna te
Ey dayika min Kurdistan
Şûşa dilê min şikayî be
Rondikên çavên min dilopên xwînê bin
Hejar û belengaz
Bêper û bask bim
Bes ji bo te bim
Wê dîsa her serbilind bim
Ey dayika min Kurdistan
Evîn û hesreta dilê min
Çend dûr jî bim ji te
Ewqas nêzî di dilê min de
Xwîn û barût
Av û agir
Her ku birijînin li ser dil û hinavên te
Atoman jî bibarînin li ser çiya û gerdena te
Dîsan wê bibêm
Dilê min te bi xem e
Ez qurbana axîn û nalînên te me
Ey dayika min Kurdistan

Destûr

Destûr bidin
Canê xwe ji zarokên vî welatî re bikim mertal
Destûr bidin

Xewnê dilê dayîkên vî welatî
Li dinyayê bidim xwendin
Derstûr bidin
Tîna Agirê sînema Amûdê bitefînim...
Destûr bidin
Newroza Welatê Rojê
Bi xemla Bêrîvan SASON tacîdar bikim
Destûr bidin

Di geşta xwe ya nivîskarî û wêjeyî de, Bedran Penaber li Zanîngeha Selahedînê xelateke çîrokê û yeke helbestê wer digire.

Helebçe bi xwe re bibim
Mihabadê
Bi hev re li Kaşê MIŞTENÛR
Her dû çavên ARÎNÊ maç bikin
Destûr bidin...

Xwedayo

Dibên çima wêneyên peyva
Êdî nema di zeviya helbestên te de
Şahiya evînê gulbaran dikin
Nizanin agirê qelûna xeşîman
Dadgeha peyvên min kolane
Dilê helbesta
Ne carekê
Bi dehan car li ser sînga min

Mist mist kevir lêdane
Xwedayo
Nizanin di bihara helbestên min de
Çend sêdaran
Bajarên evînê
Bi dadgehên xapînok
Noqî avê kirine
Û çend caran okyanosên avê
Li gemiya vegerê
Esmera dilê min çikandî ne
Xwedayo
Nizanin
Çend caran dadgehên xapînok
Şûrên xezebê
dirêjî stûyê helbestên min kirine
Û qedehên meyê 'nenoşîcan be'
bi ser de rijandine

Neçe

Neçe şev narazên
Ji bêriya dengê te
Çi bela ye bi dilê te ketî
Ku tu çûyî
Wê helbest bimirin
Ez ê çi bikim
Ji goristana peyvan...
Bêhna helbesta
Ji rûyê te tê
Zeriya nû çav kildayî
Were neçe
peyvan bi dû nazya xwe nelîlîne

Tu Nehatî

Adarê Agirê Newrozê li xwe kiriye
Xince xinca gula ye
Tu nehatî
Bihar sor û zer xemiliye
Gurm e gurma daholê ye
Tu nehatî
Kevoka pala xwe dane ezmanê şîn
Ha , ha hêlîna çêkin
Tu nehatî
Kenê evîndaran tama xwe daye stranên zozana
Wê dîsa Payîz bi xemla nû kevin
Tu nehatî
Şêrîn bû hingurê reza, germa Havînê
Wê zerî û esmer bixwin
Tu nehatî
Keviyên berfê sîpanên bilind xemilandin
Şemîtok bi ser me de heliyan
Tu nehatî
Tu nehatî
Tu nehatî...

Qure Nebe

Dil ketiyê balaya te
Qeleya bilind
Dara bi tenê
Hûriya çolê me...
Bes e, ewqas giranî bêmane ye
Ditirsim bimirim
Kevirek bi çoka te keve
Qure nebe
Bero teriya dil
Rehmê were...
Ma ji çi re gewr in
Spiya singûberên te
Lêvên sor dibê qemer
Ma ji çi re reşqetre ne
Hetawa çavên te
Birih bistên tîra
Rû gurzên gula
Ku bi azayî şa nebî
Bi dost û dila...
Ewrên reş li ezmanên sayî nayên
Gelawêj û Berfanbar û Kewçêrîn
Wê biborin
De waz lê bîne
Li gilî û nazan
Te dîsa bi gilî pora xwe hildaye
Û hîn hogirê te birîndar e
Ber bi hilatê rewşa xwe girê de
Hê dil li hêviya hatina te ye
Bi bayê Payîzê
Em ê bi qîrîn strana
Nexwa na !
Ma tê wê bejna zirav li kû bihejîn î
Kor bibî
Ku hogirê te nebîn e....

Taze Hatî !

Kanî çika
Av şêlo bû
Mala bar kir
Bihar mir

Berhemeke wî ya lêkolînî li jêr navê "Tofana Nûh" di 2010'ê de derketiye û dîwaneke wî ya helbestan jî bi navê "Êdî Mirin Ne Karê Me Ye" çap bûye...ji bilî van her du berheman, aniha du destnivîsên wî ku yek kurteçîrok e û ya din jî zimanzanî ye, ji bo çapê amade ne.

Agir vemirî
Darên bilind tazî kirin
Giyayê mêrga dirûtin
Zivistan hilweşiya
Heyv bi taya penceşêrê ket
Roj nixumî
Çêlik bi firê ketin
Hêvî xeyîdîn
Evîn qediya
dimsa reza rijiya
Gotin bi avê ketin
Bîna sêva kuştin
Spîndar birîn
pelên dara weriyan
Peyv serjêkirin
Behre nema
Tembûr şika
Bilûr winda bû
Baran nema tê
Gul çilmisîn
Lîstok qedexe kirin
Zarok girîn
Çûk şeridîn
Kewan têjikên xwe firandin
Helbest şewitîn
Mela ji minarê ket
Koçeran bar kir
Çav westiya
Evîn nema...
Tu taze hatî !?
De stûyê xwe bixelîne
Bi qeşe te nebîn im...

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Berhemên Nû

Bi Navnîşana "Mirovê Wenda"...Berhemeke Şanoyî Derket

Di 20'ê Cotmeha 2017'ê de, berhema Ferhat Seyda ku nivîsareke şanoyî digire xwe, bi navnîşana "Mirovê Winda" derket.

"Mirovê Winda" ku li bajarê Qamişlo derket, ji weşanên Yekîtiya Nivîskarên Kurd-Sûriya ye û 40 rûpelan vedihwîne.

Di şanoya "Mirovê Wenda" de 4 lîstikvan hene ku bi navên: L1, L2, L3 û L4 hatine destnîşankirin û ji beriya ku perdeya şanoyê vebe, her çar lîstikvan li nêva cemawer rûniştî ne.

Qaşo lîstikvanên serek jî Behzad, Gemo, Şemo û Temo ne, lê ne wekî hemî şanoyan, lîstik ne bi vekirina perdeyê, ne jî li ser dikê dest pê dibe; lê belê L1 ji nava cemawer radibe û êdî li tiştekî digere.

L1 bi L2, L3 û L4 re dikeve di nava gengeşeyê de û li Çîkekê digere...!

Piştî demekê, ji hemiyan re eşkere dike ku ew windayî ye û li xwe digere.

Nivîskar bi awayekî pêtinazî, hem jî bi şêwazekî nepen bangewaziyekê çêdike û di vê bangewaziyê de, L1 hemî cemawerên rûniştî bi windabûnê tawanbar dike...

Şanoya "Mirovê Winda" di dawiya xwe de, tenê hevpeyvînê di navbera Qazme û L1 de dihêle.

Qazme dimire.

L1 jî wekî ku xwe bibîne, ava ku wî ji mirinê qurtal bike û jiyaneke nû jê re biafirîne, bi saya kolana erdê bi Qazmeyê mirî, bi dest dixe.

Sitêrname 4

Narîn Omer

Leyla Bedirxan Jina Rojhilatî û Kurd a Hêzdar 1908_1986

Malbata Bedirxaniyan ne tenê bi dana mêran zengîn bû, belê jinên wê jî jîr û zanyar bûn, mîna Rewşen û Leyla Bedirxan.

Taybetmendiya Leyla ew e ku ew derbasî holeke cuda ji hêla malbatê bûye (Hêla sema û hunerê), ev hêla ku derbasbûna wê di wê demê de ne tenê li ser jina Rojhilat û Kurd, belê li ser jinên welatên Ewropayê jî qedexe bû.

Dema malbata wê berê xwe dide welatê Swêsrayê û li wir bi cih dibe, ew bi dest xwendina hunerî dike, diçe Viyêna paytexta Nemsayê û xwendinê berdewem dike. Li wir cara yekemîn li ser textê reqsê disekine û xwe wekî semadareke nûjen û jêhatî dide nasîn. Paşê xwendina xwe li akademiyên Balê yên Elmanya, Ferensa û Belcîkayê berdewam dike.

Nav û dengê wê li hawîrdorê Ewropayê û li çend welatên Eerebî jî belav dibe…dibêjin ku padîşah, serok û rêvebirên Ewropa û welatên rojhilatê li ahengên wê amade dibûn û li tabloyên wê jî temaşe dikirin.

Tevlî van tiştan, Xanim Leyla netewperwerî û welatparêziya xwe eşkere dike, hestên xwe bi coş dike dema dibêje:

"Ez Kurd im. Bapîrê min Mîrê Kurdistanê bû".

Lê tişta herî balkêş ew e ku malbata Bedirxaniyan dijî biryara wê rawestaye, niyaza wê qedexe kiriye, her wiha jêderên malbatê li sere neaxivîne û navê wê neanîne li ser ziman.

Leyla guh dide folklor, çanda Kurdî û hunerê, û vê yekê di nivîsînên xwe de diyar dike.

Tabloyên wê pir in, ji wan: Şahjin Belqîs, Baliya Mar û Keçika Qereçî.

Leyla ne tenê semadar bû, belê ew nivîskar jî bû.

Ji bilî nivîsînên wê yên li ser sema û govendên Kurdan û Rojhelata Navîn, çend eser û pirtûkên wê li ser olên Zeradeşt, Hindî, Farisî û Misrî hebûn.

Li ser awayên reqsa xwe dibêje:

"Min ji reqsê her dem hez dikir, û dema em li Misrê bûn min li reqsa jinan a gerêlî temaşe dikir"

Û dibêje:

"Ez bi celebên gerêlî û nûjen radibim; lê min di hunera xwe de awayekî taybet ji xwe re afirandiye, ku ez gelekî lingan nahejînim, belê cendek û destan bêhtir".

Leyla dixwest bi hunera xwe, huner û çanda kurdî ya resen diyar bike, û bi saya bîrdanka xwe ya xurt li pêş gelan bike, ji ber ku wê gelek çîrok û çîvanok û serpêhatiyên gelêrî û şaristanî di bîrdanka xwe de veşartibûn.

Leyla bi hêz û hestên xwe, bi agahî, zanist û rewşenbîriya xwe, bi kesayetiya xwe, bi evîniya welat, xak û gel, jineke taybetmend bû.

Tevlî dûrbûn û koçberiyê; lê nav û dengê Leylayê li nava Kurdan û hemî hêlên cîhanê belav bû. Mezintirîn rojname, kovar û dezgehên ragihandinê li ser huner, nivîsîn û kesayeta wê axivîne…. Ji vê yekê bûye simbola jina Kurd û Rojhilata Navîn, û hemî jinên jêhatî û jîr.

Leyla Bedirxan di sala 1908'ê de li Stenbolê ji dayîk bûye.

Bevê wê Ebdurezaq Bedirxan e. Dêya wê Henrîta ye, ku ew bi xwe ji welatê Nemsa ye.

Keçeke wê heye, navê wê "Nêvîn" e, ew li Misrê rojnamevaneke navdar e.

Mixabin, di sala 1986'ê de li Parîsa paytexta Ferensayê, diçe ber dilovaniya Xwedê.

Leyla jineke ku divê em Kurd lê bi xwedî derkevin, li ser kar û xebata wê rawestin, da em bikaribin dilopekê ji dana wê, lê vegerînin.

Silav û aramî li giyanê wê, rêz û rumet ji ked û dana wê ya bêhempa re.

Gotinên Pêşiyan

Tenûr nesincire, nan çênabe
Ne malê pir û ne zarokên bêxêr
Bav çawa ye kur wisa ye
Mirov çi dibîne jê hîn dibe
Xebatkar birçî namînin

Xwediyê lezê her poşman e
Genimê rijyayî berhev nabe
Mala mêran kaniya zêran
Feqîrî ne eyb e, nezanî eyb e
Çav sûretê dilan e

Kurdî Xweş e

Peyamnihêr	مراسل	Mifadar	مفيد	Lêker	فعل	Vebîner	مكتشف
Avahîsaz	مهندس معماري	Jiyaname	السيرة الشخصية	Bireser	مفعول به	Reşnivîs	مسودة
Mey	خمر	Bertek	ردة فعل	Kirde	فاعل	Jîngeh	بيئة_محيط
Meyger	ساقي الخمر	Rojnamevan	صحفي	Hevok	جملة	Rûber	مساحة
Xerçeng	السرطان في علم الفلك	Ragihêner	اعلامي	Rêziman	قواعد اللغة	Hevwate	مرادفات

Xaçepirs

	1	2	3	4	5	6	7	8	9
1									
2					■		■		
3				■					
4		■	■						
5				■		■			
6							■		
7		■						■	
8			■	■					
9					■				

Sitûnî

1-Dadileqandî
2-Navê Alî di banglêkirinê de-Du tîpên wekhev
3-Ordek-Meydan
4-Cînavka Kesane ya Xwerû ji bo kesê bihîzer(Vajî)
5-Hazirî
6-Dijwateya ronahî-Romatîzim
7-Eger+r-Cihê bavpîran(Vajî)
8-Kesê dexes ku zû qenciyan ji bîr dike-Pêşkêş kir
9-Hîm danî.Ava kir

ASOYÎ

1- Xwarina bi yek carê. (Dema Bihurî_Yekjimar)
2-Amûr bi Erebî-Du tîpên wekhev
3-Roj bi Kurdiya kevin-Menar belavkirî
4-Emrîke belavkirî
5-Peza reş(Vajî)-Sitem(Vajî)
6-Barkan belavkirî-Du tîpên wekhev
7-Xuya
8- Du tîpên wekhev-Dîwan belavkirî
9-Dewleteke ser sînorê Kurdistanê-Dûmahîk (Vajî)

Amadekirina Xaçepirsê: Îsa Bavê Siwar

Serpêhatî

Bersiva Xaçepirsa Çûyî

	1	2	3	4	5	6	7	8	9
1	g	o	r	c	i	s	t	a	n
2	o	r	m	a	n	■	t	t	a
3	r	d	a	m	î	n	■	■	d
4	i	i	■	î	■	■	k	a	l
5	s	n	i	■	p	r	î	■	i
6	t	■	d	ê	■	■	ş	e	h
7	a	r	a	m	î	■	i	m	■
8	n	o	k	■	d	î	m	e	n
9	■	s	a	r	k	i	r	i	n

Yê Bêol...Kuştina Wî Helal e

Seydayê Tîrêj

Dibêjin Qulingek hebû her sibeh dihat ser naqûsa kenîsê zelq dikir. Ne rojek ne dido, dergevanê kenîsê ji keşe re got. Keşe got: Ma em ê çi bikin, heywanekî Xwedê ye.

Dergevan got: Xem nake îşê wî li cem min e.

Dergevan rabû tasek tijî eraq (mey) kir, sênîk tijî goştê devê kir û xesek hûr kir, her sê li dor naqûsê danîn.

Quling serê sibê wek berê hat bi ser naqûsê de zelq kir.

Li dora xwe nerî, eraq, goşt û xes dîtin.

Pêşî ket ser goşt têr xwar, paşî hat xes jî xwar û dûre tî bû, ket ser wê eraqê ew jî vexwar.

Demek pir neçû ji eraqê sergêj bû, diçû wir de û dihat vir de, nema ber xwe didît. Ji ser pişta kenîsê hate xwar û li erdê ket.

Dergevan di ser re sekinî û got:

-Mîrat, eger tu File baya bi ser naqûsê de zelq nedikir. Eger tu Misilman baya eraq venedixwar. Eger tu Cuhû baya goştê Devê nedixwar. Eger tu Êzîdî ba te xes nedixwar.

Naxwe kesê bê ol kuştina wî helal e.

Rabû serê wî jêkir.

Her wekî Tîrêj gotiye:

Kesê bê ol be guh nadî gunahan
Çi araq û xes û goştê Deva bî
Li cem koran çi ferqe ey birader
Çiko roj be çi tarîka şeva bî.

Têbînî:

Di hejmara 67'ê ya Rojnameya Bûyerpress de, serpêhatiyek li jêr navê "Tu Çi Bikî Wê Bêye Pêşiya Te" hat weşandin, ew serpêhatî ya Seydayê Tîrêj e.